

# Daxuyanîya Gelemperî

Ji bo: netewa Kurd a dîl û bi sebir li seranserî Kurdistanê û li dervê welêt!

Ji bo: hemû partîyên Kurd û Kurdistanî û sazîyên polîtîk û nepolîtîk ên li welêt û li dervê welêt!

Ji bo: hemû kesayetîyên Kurd ên welatparêz, oldar û civakî ên li welêt û li dervê welêt!

## Silabên azadî û serxwebûnê li we

Konferansa 6an a Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê dê Şemîya 18/4/2009an li Kraliyeta Yekbûyî (KY) li Londonê bê lidarxistin.

Konferansa 6an a Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê wê di şerd û mercên wisa de bê lidarxistin ku ji ber planên dagirkerên Kurdistanê û bi tevlêbûn û hevkarîya rayedarên Kurd li Başûr, herêma azad a Başûrê Kurdistanê li nav sînorên Iraqa dagirker hatiye vegerandin!

Konferansa 6an a Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê wê di şerd û mercên wisa de bê lidarxistin ku dagirkerên her çar parçeyên Kurdistanê careke din ji bo rûxandina tevgera azadîya gelê me dek û dolaban digerin!

Konferansa 6an a Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê wê di şerd û mercên wisa de bê lidarxistin ku ramanên qurmiçandî û xapînok ên Îranîbûn, Iraqîbûn, Tirkîyeyîbûn û Sûrîyeyîbûnê di nav partîyên ku bi Kurdî dipeyivin û xwe Kurd dihesibînin de, di bin dirûşmên “federalizm”, “mafên wekhev”, “hemwelatîyên çîna yekem” û hwd de serdest bûne û bergeha têkoşîna me ya welatparêz û rizgarîxwaz û ramanên avakirina dewleteke Kurd tarî dikin!

Konferansa 6an a Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê wê di şerd û mercên wisa de bê lidarxistin ku li gel bi dehan serhildanên mezin û piçûk û hejarî û fidakarîyên bê hejmar ên li hemû parçeyên Kurdistanê, hîn jî çarenûsa me ne zelal e û asoyê têkoşîna me ya azadîyê tarî ye!

Konferansa 6an a Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê wê di şerd û mercên wisa de bê lidarxistin ku ne tenê sûcdar û failên Enfalan, bombeyên kîmyewî û qirkirina Kurdan nehatine cezakirin, lê belê her weha hikûmeta nuh a Iraqê ku di bin kontrola Şîîyan de ye, dixwaze Ereben sunî, hêzên nijadperest û dilxwazên rejîma berê bikar bîne ku Kurdistanê careke din dagir bike û tevkujîya Kurdan bike.

Konferansa 6an a Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê wê di salvegera (50.) damezirandina “KAJYK” (Komela Azadî, Vejîn û Yekîtiya Kurdan/Komeley Azadî û Jîyanewe û Yeketî Kurd) de bê lidarxistin. Ji ber vê yekê, di pêvajoya bernameya konferansê de, dê semînar û gotûbêjên taybetî ji aliyê endamên damezirêner ve bê lidarxistin!

Hemwelatîyên hêja!

Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê dûmahîkeke rêça pîroz a “Komela Zekaf”, Kraliyeta Başûrê Kurdistanê ya di bin serokatîya Kralê Kurdistanê yê nemir Şêx Mahmûd de, şoreşa “Komela Xoybûn” di bin serokatîya Îhsan Nûrî Paşa de û Komara Serbixwe ya Kurdistanê di bin serokatîya Qazî Mihemed de ye. Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê dûmahîka armancên bilind û stratejîya sîyasî û netewî ya KAJYK e; her weha platform û navendeke ji bo hemû çalakvanên rastî yên ramanên pîroz ên azadî û serxwebûna Kurdistanê ye.

Hun hemû kesên li dijî koletî û dagirkerîyê û ku ji bo xwe û netewa xwe şabûn û serketinê dixwazin, tên vexwendin ku vê konferansê hemêz bikin. Kurdistan di xetereke mezin de ye û tenê Kurd bi xwe dikanin welat û netewa xwe ji nav lepên dagirkerên xwînxwar rizgar bikin û rûxandina wan rawestînin. Yekîtî, hevkarî û tevlêbûna çalak a we bo formulkirina stratejîya netewî û platformeke hevbeş pêwîst e. Yekgirtin, hevkarî û tevlêbûna we ya aktîv ê di rêça pêkanîna armancên bilind ên gelê me yê bindest û damezirandina dewleteke serbixwe ya Kurdistanê de bibe bersîvên maqûl.

Em ji hemû kesayetî, partî û sazîyên neteweperwer ên Kurd û Kurdistanê dixwazin ku bersîva vê vexwendina konferansê bidin. Tevlêbûna we ya çalak û bi bawerî bo Konferansa 6an ê hest û bawerîya we ya bilind bo rizgarîyê û damezirandina dewleteke serbixwe ya Kurdistanê raber bike.

Ev daxuyanî yê ji hemû alîyên sîyasî, olî û civakî yên Kurdistanê re bê şandin ku tev li Konferansa 6an bibin. Em hêvî dikin ku Konferansa 6an bikin yeka wisa ku ji bo bi giştî rizgarkirina Kurdan ji bindestî û dagirkerîyê biryara çarenûsî bide û dîrokî be.

Heke hun dixwazin nivîs, pêşniyar û daxuyanîyên xwe yên tevlêbûna Konferansa 6an bişînin, an jî bêtir agahî bistînin, ji kerema xwe li gel navnîşan û hejmarên telefonê yên jêrîn têkilî çêbikin:

**Kingreya Nîştîmanî ya Kurdistanê**

**WKA, Palingswick House**

**241 King Street**

**London W6 9LP**

**[wka@knc.org.uk](mailto:wka@knc.org.uk)**

**Tel: 0044 -208 748 7874**

**Faks:0044 - 208 741 6436**

**[jeerkamil@yahoo.com](mailto:jeerkamil@yahoo.com)**

**[knc@ribrahim.de](mailto:knc@ribrahim.de)**

**0049- 82336121**

**KNC**

**P.B. 205 Holmlia**

**1204 Oslo, Norway**

**0047- 9383 99 53**

**[post@kncscandinavia.com](mailto:post@kncscandinavia.com)**

Em ê dûre li ser cîhê ku konferans ê lê bê lidarxistin agahîyê bidin hemû alîyan!

Serfirazî ji bo têkoşîna yekbûyî ya netewa Kurd ji bo azadî, demokrasî û damezirandina dewleteke serbixwe ya Kurdistanê!

Bijî azadî, bijî serxwebûn, bijî Kurdistan!

**Kongreya Nîştîmanî ya Kurdistanê**  
**Komîteya Amadekarîya Konferansa 6an**